Rapora YASA ya mehane
Navenda Kurdî ji bo Lêkolîn û Rawêjkariya Yasayî

Tebax 2009

Rojin Remo

Ibrahim Biro

YA§A e.V.

Kurdish Centre for Legal Studies and Consultancy

Kurdisches Zentrum für juristische Studien und Beratungen

Navenda kurdî ji bo lêkolîn û rawêjkarîya yasayî

المركز الكردي للدراسات والاستشارات القانونية

YASA e.V.
Postfach 7624
53076 Bonn
www.yasa-online.org

Naverok:

- Kurdek ji bajarê Efrînê wendayî ye
- Rojîn Remo hate binçavkirin
- Du jinên kurd li şamê hatin binçavkirin
- Şemsedîn Hemo azad e.
- Dadgeha hindek serkirdayetiyan pêk hat û yan hindekan jî taloq bû
- Leşkerê 26an hate kuştin!!
- Çar kurd serbest hatin berdan
- Sekretêrê partiya çep a kurd li sûriyê Mihemedê Mûsê hate binçavkirin û piştî demekê serbest hate berdan
- Dadgeha Ibrahîm Biro
- Ahenga xelatkirina xwendekarên kurd hate qedexekirin
- Emced Osman azad e
- Hejmara leşkerên kurd ên ku hatine kuştin gihîşte 27an
- Kurdek serbest hate berdan lê heya salekê divê ku dûrî herêma xwe be
- Li Qamişloyê çar kurd hatin binçavkirin
- Mamoste Ebdil Qadir Xeznewî ji hêla ewlekariya sûriyê ve hate vexwestin
- Welatiyê kurd Elî Mihemed Masûm Mamo piştî şeş meh zindan serbest hate berdan
- Siyasetmedarê kurd Ebdil Fetah Dihêr ji aliyê şaxê Felestînê ve li Şamê hate vexwestin
- Rojîn Remo ji lêxistina pir di nexweşxaneyê de ye!
- Li dêrika hemko çar kurd ku didu ji wan jin in, hatin binçavkirin
- Fewaz Mihyedîn Hesen hate binçavkirin

Kurdek ji bajarê Efrînê wendayî ye
Hate ragihandin ku roja 01.08.2009an de xortê kurd Elî Hesen Hesen, diya wî Zeyneb e, ji gundê Xizyana jêrîn e, û li taxa Eşrefiyê li bajarê Helebê nişţecih e, ji roja 26.07.2009an ve wendayî ye.

Ew gelek caran ji aliyê şaxên ewlekariyê li bajarê Efrînê hati bû vexwestin. Tê zanîn ku birêz Elî Hesen serbixwe ye û têkiliyên wî bi tu rêxistinên siyasî ve tunene, û bi tena xwe kar dike daku diya xwe û zarokên birayê xwe û jina wî xwedî bike.

Rojîn Remo hate binçavkirin
Roja 02.08.2009an hate ragihandin ku roja 29.07.2009an komek mezin ji hêzên ewlekariya siyasî ya bajarê Minbic (Navçeya Helebê) êrîş birin ser mala welatiyekî kurd li bajarê kobanî û birêz Rojîn Remo binçav kirin.

Rojî Remo, navê bavê wê Cumaa ye, diya wê Sebriya ye û li bajarê Tirbespiyê di sala 1970î de ji dayik bûye. Rojîn Remo endama hevgirtina stêrik a jinan e.

Du jinên kurd li şamê hatin binçavkirin
Hate ragihandin ku dora katjimêr 13:30 roja 03.08.2009an komek ji hêzên çekdar ên ewlekariya siyasî li bajarê şamê êrîş birin ser mala welatiyekî kurd li taxa Zorava li Şamê û du jinên kurd binçav kirin. Jinên ku hatin binçavkirin ev in:
1- Felek Naz Xelîl, diya wê Gulê ye, jidayikbûn: Dêrik-Eyn dîwer 1968
2- Efra Mûsa Mihemed, diya wê zekiya ye, jidayikbûn Hesiça 1975

Heya aniha çarenivîsa wan ne diyar e. Tê zanîn ku Felek Naz nexweşiyên Dil pê re hene û Efra Mihemed jî lingê wê yê rastê felc bûye.

Şemsedîn Hemo azad e.
Hate ragihandin ku roja 02.08.2009an birêz Şemsedîn Hemo (Endamê komîteya siyasî ya PYKS) serbest hate berdan.Tê zanîn ku Şemsedîn Hemo roja 29.07.2009an ji aliyê ewlekariya siyasî li bajarê Helebê hati bû binçavkirin.

Dadgeha hindek serkirdayetiyan pêk hat û yan hindekan jî taloq bû
Hate ragihandin ku roja 09.08.2009an dadgerê tek ê leşkerî li bajarê Qamişlo sezayê 3 mehan li birêz Nesredîn Birhik, Fêsel Naso û Fener Cemîl birî.
Herwiha dadgeha herdû endamên serkirdayetiya PYKS birêz Hesen Salih û Ibrahîm Biro heya 05.10.2009an hate taloqkirin.

Leşkerê 26an hate kuştin!!
Hate ragihandin ku leşkerê kurd Hogir Resûl Hiso, Diya wî Zeyneb e, 8 Meh leşkerî kiri bû û 22 salî ye, roja 08.08.2009an malbata wî bihîst ku kurê wan jiyana xwe ji dest daye û sedemên mirina wî jî ew e ku bi Elektrîkê hatiye kuştin!!
Ewî li Qiteyfê nêzîkî Şamê erkê parastina welat pêk tanî. Termê wî dê li bajarê Qamişlo li goristana Mehmeqiyê bê binaxkirin.

Çar kurd serbest hatin berdan
Hate ragihandin ku roja 08.08.2009an birêz:
1- Cihad Eladîn Hisên (Diya wî Emîra ye)
2- Rêber Nûredîn Hisên (Diya wî Necah Gulo ye)
3- Feremez Seîd Sadûn (Diya wî Nûra ye)
4- Ebdil Qudûs Ebdiletîf Hisên (Diya wî Tirkiya ye)

Ji aliyê dadgerê tek ê leşkerî ve serbest hatin berdan.

Hemû jî ji taxa Hilêlîkê ji bajarê Qamişlo ne û di 30.01.2009an de ji aliyê hêzên ewlekariya tewankariyan ve hati bûn binçavkirin. Tewana wan jî endamtiya partiya PYD û lidarxistina kombûnên ciwanên demoqrat bû. Piştî ku di girtîhgehan baş hatin azarîkirin, 6 mehan di girtîgeha bajarê Heiçayê de dimînin û dawiyê ji aliyê dadgerê tek ê leşkerî ve li Qamişlo têne berdan.

Sekretêrê partiya çep a kurd li sûriyê Mihemedê Mûsê hate binçavkirin û piştî demekê serbest hate berdan
Hate ragihandin ku birêz sekretêrê partiyê Mihemedê Mûsê ji hêla hêzên ewlekarî û bi beşdariya kargêrê navçeya Dirbêsiyê, roja 08.08.2009an hate binçavkirin.
Birêz Mihemedê Mûsê hate ber destê dadgerê tek ê leşkerî li bajarê Qamişlo. Ew beriya demekê hati bû dadgehkirin û diva bû sezayê ku lê hati bû birîn, pêk bîne!

Paşê hate ragihandin ku roja 31.08.2009an de birêz Mihemedê Mûsê serbest hatiye berdan.

Dadgeha Ibrahîm Biro
Roja 09.08.2009an birêz Ibrahîm Biro endamê komîteya ramyarî ya PYKS hate ber destê dadgerê tek ê leşkerî li bajarê Qamişlo. Ew di 28.04.2009an ji aliyê ewlekariya komarê ve li Qamişlo hati bû binçavkirin û paşê bo şaxê Feyhaa yê ewlekariya ramyarî ve li şamê hati bû guhastin, paşê bo dadgeha leşkerî li helebê û dawiyê bo girtîgeha bajarê Qamişlo bicih bû bû.

Ev cara yekem e ku ew tê ber destê dadger. Di nav axafitnên xwe de birêz Biro wiha got: Partiya Yekîtî ya kurd li sûriyê tê dikoşe daku kurd weke miletekî bê venasîn û mafên wî yên netewî bicih bibin û herwiha çewisandin ji ser gelê kurd rabe wek bênasnamekirin û yasafermana 49an. Partiya Yekîtî dixebite daku çareseriyeke aştiyane ji doza kurdî re li sûriyê di çarçoveya yekîtiya welêt de bête dîtin.

Der barê çalakiyên xwe peyivî û got: Ya dawî di 28.02.2009an de bû bo protestokirina yasafermana 49an bû. Dadgeha wî heya 05.10.2009an hate taloqkirin.

Ahenga xelatkirina xwendekarên kurd hate qedexekirin
Roja 09.08.2009an hate ragihandin ku li bajarê Serêkaniyê ahengek bo xelatkirina xwendekarên kurd hati bû amadekirin.
Ji nişka ve hêzên asayîşên sûriyê cihê ahengê toq kirin û xwendevan ji hev belav kirin û ne hiştin ku aheng bigihê dawî.
Aheng ji aliyê Komeleya ciwanên kurd ve hati bû amadekirin.

Emced Osman azad e
Hate ragihandin ku roja 10.08.2009an rojnamevanê kurd Emced Osman li bajarê Helebê serbest hate berdan. Tê zanîn ku ew di roja 17.05.2009an li bajarê hesiçayê hati bû binçavkirin û çarenivîsa wî ne diyar bû. Emced Osman kovara Hogir li Qamişlo belav dikir.

Hejmara leşkerên kurd ên ku hatine kuştin gihîşte 27an
Hate ragihandin ku roja 13.08.2009an leşkerê kurd Mistefa Ibrahîm (1989an ji dayik bûye) li gundê Goran (Jindirs-Efrîn) hate binaxkirin.
Ji malbata wî re hati bû ragihandin ku ew di dema pasvaniyê de bi guleyekê xwe kuştiye!!
Tê zanîn ku ji 12 avdara 2004an ve û heya aniha û roj bi roj rûdana kuştina leşkerên kurd di dema erkê parastina welêt de li sûriyê, bêtir dibe.

Kurdek serbest hate berdan lê heya salekê divê ku dûrî herêma xwe be
Hate ragihandin ku roja 16.08.2009an birêz Xelîl Yûsif Osman ji aliyê desthilatdariya sûriyê ve serbest hate berdan.
Tê zanîn ku birêz Xelîl ji beriya salekê ve (tîrmeha 2008an) bi 4 welatiyên kurd re hati bû binçavkirin. Tevî ku birêz Xelîl hatiye berdan, divê ku ew salekê dûrî parêzgeha (Herêma) xwe be.

Li Qamişloyê çar kurd hatin binçavkirin
Hate ragihandin ku roja duşemê 10.08.2009an çar welatiyên kurd ji hêla hêzên ewlekariya sûriyê ve li bajarê Qamişlo hatin binçavkirin.

1- Dilşêr Xetîb Ehmed ji taxa rojava ye li bajarê Qamişlo, ajovanê tirimbêlê ye, bavê sê zarokan e, ji hêla hêzên ewlekariya siyasî ve li Qamişlo hate binçavkirin û bo şaxê ewlekariya siyasî ya bajarê hesiçayê hate guhastin.

2- Enewr Ebdil Rehman Elî, diya wî Sakine ye, sala 1975 hatiye ser rûyê dinê, katjimêr 03:00 sibehê roja 10.08.2009an hate binçavkirin.
3- 4- Idrîs Mihemed Hesen Şêxmûs û Lûkan Silêman Xidir ji taxa Qedûr Beg in li Qamişlo ji hêla hêzên ewlekariya komarê ve hatin binçavkirin û heya aniha çarenivîsa wan ne diyar e. Tê zanîn ku ev her çar welatiyên kurd tu çalakiyên wan ên siyasî tunene, herwiha tu tewankarî jî ne kirine.

Mamoste Ebdil Qadir Xeznewî ji hêla ewlekariya sûriyê ve hate vexwestin
Hate ragihandin ku ji roja 10.08.2009an û heya 19.08.2009an birêz mamoste Ebdil Qadir Xeznewî ji hêla ewlekariya leşkerî ya bajarê Qamişlo ve gelek caran hatiye vexwestin. Sedema van vexwestin û vepirsînan jî ew e ku birêz E.Xeznewî du gotar nivîsî bûn yek ji wan li ser hilbijartinên herêma Kurdistanê bû û ya din jî li ser koça dawî ya hunermend Aramê Dîkran bû.

Mamoste Ebdil Qadir Xeznewî beriya demekê dev ji karê xwe berda bû ji ber ku temenê wî mezin bûye, û beriya demek kurt ew û çend mamosteyên kurd ji bo bajarine dûrî navçeyên wan hatin guhastin, tevî ku beriya wê birêz E.Xeznewî ji aliyê kombenda mamosteyan a bajarê hesiçayê û bi beşdariya Şaredarê bajêr û serkirdayetiya siyasî, hati bû xelatkirin!

Di vê dema dawî de vexwestinên ewlekariya sûriyêji nivîskar û rewşenbîran re bêtir bûne. Gelek ji wan jî bo bajarê Şamê têne vexwestin, ji ber ku rewşa aborî jî ne gelekî baş e, ziyanek mezin di warê darayî de digihê wan kesan. Sedemên vexwestinan jî bi gelemperî gotar û nêrînên wan li ser tora Internetê ne.

Welatiyê kurd Elî Mihemed Masûm Mamo piştî şeş meh zindan serbest hate berdan
Hate ragihandin ku roja 20.08.2009an birêz Elî Mihemed Masûm Mamo ji aliyê dadgerê leşkerî li Qamişlo Eymen Wefîq Esmender, serbest hate berdan.

Birêz Elî ji bajarê Dirbêsiyê ye û sala 1958an de li gundê Berkevirê ji dayik bûye. Roja 17.02.2009an ji aliyê ewlekariya siyasî ve hati bû binçavkirin û piştî vepirsîneke dirêj bo şaxê Feyhaa yê bajarê Şamê hati bû guhastin û paşê ew vegerandi bûn zindana bajarê hesiçayê.

Siyasetmedarê kurd Ebdil Fetah Dihêr ji aliyê şaxê Felestînê ve li Şamê hate vexwestin
Hate ragihandin ku roja 15 û 16.08.2009an birêz Ebdil Fetah Dihêr serkretêrê hevgirtina azad ji hêla şaxê ewlekariyê li Şamê (Şaxê Felestîn) hatiye vexwestin.

Di vê dema dawî de vexwestinên ewlekariya sûriyê ji nivîskar û rewşenbîran re bêtir bûne. Gelek ji wan jî bo bajarê Şamê têne vexwestin, ji ber ku rewşa aborî jî ne gelekî baş e, ziyanek mezin di warê darayî de digihê wan kesan. Sedemên vexwestinan jî bi gelemperî gotar û nêrînên wan li ser tora Internetê ne.

Rojîn Remo ji lêxistina pir di nexweşxaneyê de ye!
Hate ragihandin ku roja 21.08.2009an endama hevgirtina stêrik Rojîn Remo ya ku di roja 29.07.2009an de hati bû binçavkirin, ji ber lêdana pir di zindanê de bo nexweşxaneya Kenedî ya bajarê Helebê hatiye guhastin û rewşa wê pir dijwar e.

Malbata wê xwest lê bipirse, lê bersiva karmedendên nexweşxaneyê ev bû: Ev nav li rex me tunenye!!! Piştî vê gotinê gumana malbata wê bêtir bû, ku keça wan bi navekî din ketiya nexweşxaneyê de û biryar ji aliyê ewlekariyê hatiye standin bo qedexkirina serdana wê!

Rûdana veşartina çalakvana kurd Rojîn Remo rûdana veşartina Şêx Maşûqê Xeznewî tîne bîra mirov û herwiha mamoste Osman Silêman jî ku herdû jî bo nexweşxaneyê hati bûn guhastin û paşê hate xuyakirin ku ji ber lêdanê jiyana xwe ji dest da bûn.

Herwiha birêz Feleknaz Xelîl û Efra Mihemed ên ku di 03.08.2009an de ji hêla ewlekariya siyasî ve li Şamê hati bûn binçavkirin, heya aniha çarenivîsa wan ne diyar e û herdû jî nexweşiyên dijwar bi wan re hene.

Tê zanîn ku şaxên ewlekariya sûrî hemû kiryarên wiha bi azadî pêk tînin û gotinên wek yasa, zagon û mafên mirovan di ferhengên wan de tunene. Gelekî mirovan azar dikin û di encamê de ew mirova jiyana xwe ji dest didin wek birêz Ehmed Hisên Hisên endamê encûmena PYD yê ku di 02.08.2004an de hati bû kuştin, birêz Şêx Maşûqê Xeznewî yê ku di 01.06.2005an de hati bû kuştin û herwiha birêz Osman Silêman yê ku 18.02.2008an hati bû kuştin.

Heya aniha jî endama PYD Naziye Ehmed Keçel ji sala 2004an ve wendayî ye û çarenivîsa wê ne diyar e!

Li dêrika hemko çar kurd ku didu ji wan jin in, hatin binçavkirin
Hate ragihandin ku roja 16.08.2009an li bajarê Dêrika Hemko çar kurd hatin binçavkirin. Ew jî ev in:
1- EsmaMurad Samî (Diya 8 zarokan e)
2- Ayhan Murad Samî (Diya 5 zarokan e û ji gundê Girkê Leqê ne)
3- Yûsif Sêfo (Bavê 3 zarokan e)
4- Ednan Dêmo

Ev çar welatiyên kurd ji aliyê hêzên ewlekariya siyasî ve hatin azarîkirin û zext li wan hatin kirin, daku bi hêzên elwekariyê re kar bikin. Aniha jî bo şaxê ewlekariya siyasî ya bajarê Hesiçayê hatin guhastin û sedema binçavkirina wan jî beşdariya wan di aheng û şahiyên netewî yên kurdî de ye. Heya aniha jî çarenivîsa wan ne diyar e.

Fewaz Mihyedîn Hesen hate binçavkirin
Destpêka meha tebaxê welatiyê kurd Fewaz Mihyedîn Hesen ji bajarê Amûdê û bi Fewazê hesinkar tê naskirin, ji bo şaxê ewlekatiya Şamê (Şaxê Felestîn) hate vexwestin.

Tê zanîn ku di 29.03.2009an de hêzên ewlekariya leşkerî li bajarê Amûdê sê welatiyên kurd binçav kiri bû ew jî ev bûn: Fewaz Mihyedîn Hesen, Mihemed Seîd Çolî û Ehmed Silêman Mamo.

Hersê welatiyên kurd bo şaxê ewlekariya şamê (Şaxê Felestîn) hati bûn guhastin û piştî 3 mehan di 28.06.2009an de û bêyî ku bêne tewabarkirin, bo şaxê ewlekariya siyasî ya bajarê hesiçayê hatin guhastin û li wê de biryara berdana Mihemed Seîd Çolî hate dayîn û piştî 15 rojan herdû welatiyên din jî serbest hatin berdan.